HEYVA SOR A KURDİSTANÊ

Alîkarî, piştgirî û bi hevre parvekirin rûmeta mirovatiyê ye. Hejmar:11 Sal: 2021

Lí devereke eger ríhê hevkaríyê tínebe, avakírína cívakî kêm dímîne. Hun bí alîkaríyên xwe díkarín cívakê lí ser píyan bígrín.

PENABERÊN LI SER SÎNORÊ BELARÛS Û POLONYAYÊ

Heyva Sor a Kurdistanê e. V.

Wilhelmstr. 12 D-53840 Troisdorf
Tlf: 02241 / 97 52 583
Tlf: 02241 / 97 52 585
Fax: 02241 / 97 52 584
E-Mail: heyvasor@web.de

Kreissparkasse Köln
IBAN: DE 49 370 502 99 000 40 10 481
BIC / SWIFT: COKSDE 33XXX

www.heyvasor.com

Li Kurdistan û Rojhilata Navîn, ji ber êrişan, şerê navxweyî, felaketên xwezayî, xizanî û nexweşiyan, bi mîlyonan mirov ji bo li ser pîya bimînin, liberxwe didin. Li Kurdistanê civaka ku ji aliyê hêzên serdest bi xizanî, bê karî û birçîbûnê re rû bi rû hatiye hiştin, rewş hê jî xerab e. Li gel êriş û zextên serdestan, vîrûs koronayê jî rê li ber encamên kambax vekir. Ji ber vê yekê, pêwîstiya alîkariya bi mirovên muhtac re ji her demê zêdetir bû.

Ji ber van sedeman beşek mezin mirov koçber bûne, hê jî nebûne xwedî cihe û warên ku karibin xwe parîyek nan lê bixwin. Gelek ji wan bi hêviya ku bibin xwediyê jiyanek aram, li ser rêyên koçberiyê şerpeze û perîşan dibin. Bi hezaran ji wan li ser rêyên koçberiyê, li şûna jiyanê rastî mirinê tên. Ji xwe karwanên koçberên ku di Derya Sipî û Derya Ege, sînorê Polonya- Belarûsê û li ser rêyên Ewrûpayê jiyana xwe ji dest didin, vê rastiyê radixe ber çavan.

Li hemberî vê trajediyê erka herî bingehîn ya sazî û dezgehên mirovî ew e ku karibin pêşî li pêla koçberiyê bigrin û pêdiviyên wan kesên muhtac bicih bînin. Heta niha saziyên ku di bin navê alîkariyên mirovahî de heta kîjan radeyê ev erka xwe bicih anîne, ev yek mijara lêpirsînê ye.

Bi armanca alîkarikirina mexdurên şer, sala 1993'an Saziya Alîkariyê Heyva Sor a Kurdistanê weke projeyeke pêwîst hat avakirin. Tevahiya salên derbasbûyî, Heyva Sor a Kurdistanê bi kar û xebatên xwe karîbû bibe hêviya kesên mexdûr û muhtaç.

Ji roja hatîye damezirandin her tim hewl da li gorî prensîbên alîkariyê yên gerdûnî tevbigere û li ser hîmê vê rastiyê mohra xwe li gelek xebatên pîroz daye. Di çarçoveya xebatan de, saziya me heya niha gelek navendên tendirûstiyê û nexweşxane ava kirine. Ji bo deverên ku mirov li wir mexdûr bûne, alîkariya lezgîn a derman û pêwîstiyên jiyanî peyda kirine.

Li gorî vê, Heyva Sor a Kurdistanê;

Bêyî cûdahîyê bixe nava netew û fikrê civatan, li ser hîmê prensîba hezkirina mirovahiyê destê alîkariyê dirêjî kesên muhtac kirye û di çarçoveya van xebatên xwe de, her tim xwestîye di navbera mirovan de dostanî û xweşbîniyên pêş bixe. Saziya alîkariyê ya dildariyê û bê alî ye.

Di xebatên xwe yên xizmetê de ti carî girîngiyê nade berjewendiyên xwe. Di heman demê de ji bo bibe cihê bawerîya mirovan, nabe alîgirê hêzên dijberên hev û nabe beşek ji navkokiyên siyasî, nijadî, olî û bîrdozî.

SÎNORÊ POLONYA - BELARÛS

PROJEYÊN ME

I- PROJEYA ALÎKARIYA LEZGÎN

Ev proje ji bo kesên ji ber şer, bûyerên xwezayî û rewşên awarte mexdûr dibin, tê birêve birin. Di çarçoveya vê projeyê de pêdivîyên jiyanî wek xwarîn,derman, kinc û hwd. ên kesên mexdûr tê bicîhanin. Her wiha jı koçberan kamp û stargeh tên avakirin.

1- Ji bo penaberên li ser sînorê Polonya û Belarûsê malzemeyên wek xwarin, cil û berg, powerbank, pêlav, qapût û betanî bi 20 hezar Euroyî hatin kirîn û bi hevkariya saziya alîkariyê Wir Packen's an e.V. ji van penaberan hatin şandin.

2- Ji malbatên ku ji ber lehiya ku di 31'ê Tîrmehê de li gundê Xaşkan ê navçeya Elbakê ya Wanê pêk hat de malên wan hilweşiyan û zirar dîtin re 20 hezar Euro alîkarî hat şandin.

3- Ji bo Wargeha Mexmûrê **20 hezar Euro** ji bo pêdiviyên jiyanê yên kesên mexdûr hate şandin.

4- Ji bo malbatên ku di lehiya mezin a li Elmanyayê de mexdûr bûne, ji şaredariya Euskirchenê re **5 hezar Euro** alîkari hate kirin.

5- Bi alîyê Roja Sor a li Swêdê ji Rojava re **20 hezar dolarên Amerîkan** hate şandin û vê alîkariyê ve li kampên ku koçber lê diman, pakêtên xwarinê hatin kirîn û belavkirin.

6- Ji bo penaberên Kampa Lavrîon a li paytexta Yewnanîstanê Atînayê, bi bihayê **9 hezar Euro"yî** xwarin, pêdiviyên jiyanî hate stendin,

II- PROJEYA MALBATÊN XWIŞK Û BIRA

Armanca vê projeyê bicihanina pêwîstiyên malbatên mexdûr û desteka psîkolojîk e. Di vê projeyê de di navbera malbatên mexdûr û malbatên alîkar de, pêwendiya xwişk û biratiyê hat pêşxistin û alîkarî hat kirin.

Di çarçoveya projeya malbatên xwişkûbîra de di sala 2021'an de 36 malbatên mexdûr ji vê projeyê de alîkarî girtin.

III– PROJEYA FITRE, ZEKAT Û QURBANÊ

1- Di çarçoveya projeya berhevkirina Fitre û Zekatê ya meha Remezanê de; ji bo malbatên mexdûr ên li Bakurê Kurdîstanê 30 hezar Euro alîkari hate şandin.

2- Bi wesîleya Cejna Qurbanê, bi bihayê 50 hezar Euro qurban li Bakurê Kurdistanê ji malbatên mexdûr hate belavkirin.

IV- PROJEYA ZAROKAN

Li her devera cîhanê ji ber şer, herî zêde zerar li zarokan tê kirin.
Bi armaca dermankirina birînên zarokên ku bûne mexdûrên şer û bê xwedî mane, Heyva Sor a Kurdistanê ji roja hatiye avakirin, destê alîkariyê dirêj dike. Li gorî pêwîstiyên vê projeyê, heta zarok mezin bibin û

bibin xwedî hêza xwe debarekirinê, alîkariya bi wan re dewam dike. Her wiha ji bo perwerdeya zarokên malbatên xîzan jî alîkari tê kirin. Li Kurdistanê ji ber şer û êrîşan, bi deh hezaran zarok sêwî, bêxwedî man e.

Di çarçoveya projeya zarokan de, sala 2021'an:

1- Ji bo 593 zarokên li Kurdistanê mehane alikarî tê şandin. Di sala 2021'de bigîştî 620 hezar 400 Euro, 93 hezar 600 Frankên Swîsrê, 2 hezar Pound û 93 hezar Kronên Norwecê alîkarî hatê şandin.

2- Ji Swîsreyê, ji Weqfa Zarokan a li Bakurê Kurdistanê re di çarçoveya pişgirîya perwerdê de ji bo 130 zarokan di sala 2021'an de 18 hezar 010 Frankên Swîsrê hate şandin.

V– PROJEYA TENDIRÛSTIYÊ

Armanca vê projeyê; ji kesên ku xizmeta tendirûstîyêde bê par mane re kirina alîkariya tendirûstiyê ye. Di çarçoveya vê proje de, sazîya me li herêmên şer an jî herêmên xîzan de nexweşxaneyan ava dikin. Her wiha dermanan, ambulansan, cîhazên medîkal peyda dikin û mesrefên tedawî yên kesên hêjar didê.

1- Sala 2021'an di encama serlêdanên mexdûrên şer de, ji bo dermankirin û peydakirina pêwîstiyên tendirûstiyê, saziya me bi bihayê 42 hezar

270 Euro alîkarî şandiye. Bi van pereyan, mirov hatin dermankirin, mesrefên nexweşxaneyan hatin peydakirin û ji bo kesên kêm endam re, protez hatin kirîn.

2- Ji Şengalê re ji bo xizmeta tendirûstiyê 80 hezar Euro hate şandin û bi vê alîkarîyû ve ambulansek û 2 Morg hate stendin.

3- Ji bo projeya bi armanca xurtkirina xizmetên pêşîlêgirtina penceşêrê û hêsankirina gihandina lênerîna pizîşkî ji bo teşhîskirin û dermankirina nexweşiyên pêsîrê li Rojava, bi hevkariya Heyva Sor a Kurdistanê-Îtalya û Dêra Waldensiyan 85 hezar û 800 Euro ji Heyva Sor a Kurd a Rojava re hat şandin. Bi vê alîkarîyê ve Amûrek mamografiyê hat stendin.

4- Ji alîyê Heyva Sor a Kurdistanê Îtalyayê ji bo avakirina navendên tenduristiyê yên li Rojava ji Heyva Sor a Kurd re bi gştî 291 hezar Euro hate şandin.

5- Ji 5 zarokên bi nexweşiyên kronîk ên li Wargeha Mexmûrê re 10 hezar Euro ji bo peydakirina alavên tenduristiyê û dermanan hat şandin.

6- Ji bo avakirina navenda protez, fîzyoterapî û rehebîlîtasyonê a li Rojava bajarê Qamişloyê 141 hezar Euro hate şandin.

7- Ji alîyê Heyva sor a Kurdistanê – Swîsre Ji bo avakirina navenda protez, fîzyoterapî û rehebîlîtasyonê a li Rojava bajarê Qamişloyê 33 hezar Frank hate şandin.

8- Ji Îtalyayê ji bo şandina miqdareke girîng dermanên Vîtamîn D û Amoxicillin ku ji UPP hatibûn bexşkirin, 5 hezar Euro mesrefa veguhestinê ji saziya Staffetta Sanitaria re hat dayîn û derman ji Rojava re hatin şandin.

NAVENDA PROTEZ Û REHABÎLÎTASYONÊ - QAMIŞLO

9- Li Elmanyayê ji gelek kesayet, sazî û komeleyên Amûrên tibî, sendeliyên astengdaran, derman, maske û hwd materyalênn ku hatine wergirtin bi hevkariya komek bijîşk û pisporên tenduristiyê ji Rojava re hatin şandin. Ji bo şandinê 7 hezar Euro hat xerckirin.

VI– PROJEYA PIŞTGIRÎYA DAYIKÊN AŞTIYÊ

Li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê ji bo şer bi dawî bibe, Înîsiyatîfa Dayîkên Aştiyê bi salan e dixebite. Ji bo piştgiriya xebatên wan, Heyva Sor a Kurdistanê sala 2021'an 7980 Euro alîkariya madî da Înîsiyatîfa Dayîkên Aştiyê.

VII– PROJEYA PIŞTGIRÎYA BI GIRTIYÊN NEXWEŞ RE

Armanca vê projeyê ew e ku; ji bo girtîyên nexweş li zindanên Tirkiyê di nava şertên giran de dimînin û derfetên wan ên tedawîyê nînin, alîkariya madî were şandin.

Di çarçoveya vê projeyê de, Heyva Sor a Kurdistanê, di sala 2021'an de 7200 Euro alîkarî ji bo girtiyên nexweş şand.

KAMPANYA ENDAMTIYA HEYVA SOR A KURDISTANÊ

Saziyên alîkariyê bi zêdebûna hijmara endaman xwe ve dikare destê alîkariyê dirêjî hîn bêhtir kesên mexdûr bike. Saziyên alîkariyê bi hijmara endaman xwe ve wê bizanibin ku mehane çi qas dahatên wan çê dibin û li gorî vê jî wê bikaribin plansazîya projeyên alîkariyê yên demdirêj çê bikin. Her wiha zêdebûna hijmara endaman ji saziya alîkariyê re rêya têkiliyan bi saziyên navnetewî û dezgehên fermî re jî vedike û di çêkirina projeyên hevpar de bandoreke erênî dike.

Saziya alîkariyê Heyva Sor a Kurdistanê ya ku bi armanca peydakirina pêwîstiyên jiyanî yên kesên mexdûr hate avakirin, 29 salin bê navber xebatên xwe ên alîkariya mirovahî dewam dike û tevahiya van salên derbasbûyî, Heyva Sor a Kurdistanê bi kar û xebatên xwe karîbû bibe hêviya kesên mexdûr û muhtac.

Ji bo vê hêvîya Heyva Sor a Kurdistanê ev ku ji her malekê de herî kêm kesek bîbe endamê saziyê û li gorî dilê xwe rêkûpêk mehanîya xwe bide. Kesên dixwazên bibin endam, dikarin forma endamtîyê dagrin û bigihînin Heyva Sor a Kurdistanê. Forma endamtîyê li cem xebatkarê saziya me û her wiha li ser navnîşana
înternetê www.heyvasor.com/ku/endamti heye.

ROJAVA

Prosthetics and Rehabilitation Centre - Qamishlo

HEYVA SOR A KURDİSTANÊ

HEYVA SOR A KURDISTANÊ
1993

I DEFEND HUMANITY!

TOGETHER WE SAVE LIVES

Heyva Sor a Kurdistanê e. V.
Kreissparkasse Köln
IBAN: DE49 3705 0299 0004 0104 81
BIC/SWIFT: COKSDE33XXX

www.heyvasor.com